

ji weşanên Nivîsgeha
ragihandina Encûmena
niştimanî Kurdî li Sûriya

Weşanên Siyasî

Hunerî - Çandî û Civakî

Sernûser . Yusra Zibêr

Lêvegera Ziman Mihemedê Kose

Bo têkilyê bi me re

li ser emailê

rojname.enks@gmail.com

ENCÛMEN

ENCÛMEN

JIMARA (3)

Ezmûna Dîmoqrîtî û Çand û Reftara Milletê Sûriyê
 Ji beriya derketina Koloniyolê Ferensî û ta beriya
 Yekbûna Sûriyê û Misrê di 58 an de Cihê Rezgirtin
 û Biha pêdanê bû li ser Asta Deverê û Cihanê bi
 giştî, lê Serbihûr esihdikin ku ta Çanda giştî û
 Reftara civakî jî dibe ku bê guhertin bi Bandorke
 Paşverû nehênî ne hew bi pêşveçûnek erênî.

ENCÛMEN



Dîrok : / 1 / 5 / 2018



Hejmara 3



Mihemed İsmayîl

Salvegera 120 ya rojname kurdî

Di sala 1889 an de 22 / 4 / Mîr Miqdat
 Midhet bedirxan yekemîn rojnamekî kurdî
 bi navê Kurdistan li Qahîredexist paşre
 birayê wî Abdulrehman Bedirxan ji jimara 6
 an ve ta 31 an berdewamkir

Mir ev rojname derxist û danîbû li ber
 çavên xwe armanca guhdan û hiskirina
 zanîstê di dilê milletê xwede , ta derfeta
 şaristanî , serdemî û pêşveçûnê bi de gel
 xwe û bi lende kirna asta çandî

Iro em vejandin û salvegera 120 sale mîn li
 bîra xwe tînin . bi wan qonaxên dijwar û
 delîvên ber teng têde derbas bû ye :

1- qûnaxa gurkirina peywendîyên netewî di
 nav civata kurdî de bi serpêhatî , helbest ,
 dengvedana şoreş û serhildanê kurdî . vê
 rojnamekî di karîbû hizrê netewî di singê
 kurdan de geş bike

2 - qunaxa karê bi rêxistinî , piştî
 damezrandina partî dîmoqratî kurdistan -
 sûrî di sala 1957 an de êdî weşan , pirtûk û
 rojname bi şewazekî rêxistinî belav dibû û
 di hat çapkirin ji bal partiyên siyasî ji
 bajarekî ta yê dî di hat belav kirin ta
 bighêje kovar û pirtûkan

3 - qonaxa globalizma serdemî , entrnet û
 alavên cuda cuda nişên kurdan karî bûn bi
 şewazek çak û çalak bi karbînî ta niha bi
 hezaran weşan , kovar , belavok , pirtûk ,
 û kitêbên kurdî belav dibin
 lê mîna rojnameya kurdistan pêl pêloka
 yekemîn di pêvajoya rojnameya kurdî de

Pêş Gotin

Ezmûna Dîmoqrîtî û Çand û Reftara Milletê Sûriyê ji beriya
 derketina Koloniyolê Ferensî û ta beriya Yekbûna Sûriyê û
 Misrê di 58 an de Cihê Rezgirtin û Biha pêdanê bû li ser
 Asta Deverê û Cihanê bi giştî, lê Serbihûr esihdikin ku ta
 Çanda giştî û Reftara civakî jî dibe ku bê guhertin bi
 Bandorke Paşverû nehênî ne hew bi pêşveçûnek erênî.

Ev Wêne û Dîmen û Parçên Vîdyo yên kû li ser Torên
 veguhestina civakî hatina weşandin yên Erîşa hovane û kom
 û rexistî bi ser Penaberên Kurd li Girava mitlî li Welatê
 Yonanê Dilsezên û Birînek dijwar bû ne Sebaret Kurdan tenê
 lê li cem her kesekî xwedan Hesteke Mirovanî saxlem Erê ta
 niha hijmara Qurbaniyan çarin û bihtir ji pêncî Birîndarî ne û
 mişextbûnek giştî ya Malpatên Kurdan ji kampên Penaberiyê
 û ev Talan nayê pîvan bi Talanên Zarwên nezanîne li ser
 Şingalê û Kobanê û Efrînê, lê ev cara yekemîn bû ku Êrîşek
 komkî Sivîl (Xort û Pîr û Zarok) li ser Komek Aştiyane ji
 Regeznameyên cora û cor Erebi û nexasim Sûrî û Efxanî û
 İranî û piştî Guniqbariya xwe Şahî bi Ta lana xwe li bin Sîpera
 Ala Şoreşa Sûriyê kirin Ev Bûyer tekesdike Nişanin metirs li
 ser Hebûna Kurdî li kû be heye, dibe cardî li çi Cihî be kû
 kurd bi Hawîrek xwedan Ramanek Şofînî yan Radîkalî İslamî
 rûbide Ji her Rex û Hezên Kurdistanî tê xwestin ku ne helin
 ev Bûyer bi bihûre bê ku Wane û ibret jê ben girtin da nehelin
 cardî li vêde yan li derê han ji jografiya Kurdistanê û bi
 vegekkê li Pirsame (Ev Hovîti tev ji kû hat?!) heye em
 Bersiveke bi Behwer ne binin ji têkçûna Çand û Reftara Çînin
 Sûrî yên mezin ta vê Radehê ji Harbûn û Terorê Neyartiya
 Hevpişkên Welat ,lê heye Bandora
 çend Sedemekî li ser xuyakirna vê Hovîtiya kerîti û ji wan
 Sedeman

- Milletê Erebi Çand û Zanîtiya xwe ji Jêderên û Wêjeyên
 Rijêmen Erebi yên ku bi dirêjayî neyartiya Hêvî û Daxwaziya
 Milletê Kurd dikirin

-Lîstika Dezgihên Paristinê yên Herêmî û damezrandina
 Rêxistinên Têkoşînî kedxwer wan dimezxênin Dema ku ji
 wan re gerek bin, û Hişê wan şostine bi Neyartiya Kurdan û
 Hebûna wan Herfandina Derûnî giştî ji Civaka Erebi re ji
 Encamdana Paşketina wî Zanistî û Abûrî û Nekarîna wî bigihe
 Siwargiha Şaristaniya Mirovanî bi hev re van hişt Nerx û
 Bihayên Mirovanî winda bike, û Karvedanek li cem wî afirand
 dijî her Çîn û Milletekî bi berv Pêşketin û Azadî ve diçe Li
 dawî em hêvî dikin ku Hêz û Rêxistin û Elîtên Erebi bi Rola
 xwe rabin da bikarin Guhertinek Ramanî û Çandî ji Civaka
 xwe re durist bikin beriya Dem bi bihore û bighin Xala
 nevegerê û hew bikarin Yekbûna welatperwerî wegerênin û
 ya ku heye Millet Kurd di Paşerojê de bi ser sitandina
 Biriyanê Çarenûsî bi şiyêne û hinga wê Hevpişkiya
 Niştîmanî û Biratiya Erebi û Kurdî bibe ji Mijarên Dem ji wan
 bihûrî piştî ku Kurdan bihtir Berevanî û Qurbanîdan di ber
 van Durişman de dan.



proja rojhilata Navîn a nû û Iran

Dr : Münîb Ehmed

Proja rojhilata navîn ya nû û Iran berî bêtirî 20 salan dema kolin pawil berpîrsê wezarata derve ya Amerika digot em di hewil bidin kû projeyek bi navê Rojhilata Navîn ya mazin ava bikin û dinav peyvên xwe de digot em dê rêjîma Sadam Hûseyin biruxênin û pê de di çû û digot em çî rêjîm hebe li pêş vê projê rawistê em dê wan jî tek bidin digot ev dever divê ber bi dimoqrata bûnê ve biçê tenê rûxana van rêjîmê ye ji bo vî karî rastî piraniyê me diman matmaî lê pişt re pîr tişt jî gotinên wî bi cih bûne tenê hatina partiya demoqrati li ser desthelata Amrikî ev piroje bipaşxist lê careke din hatina partiya komarî ya Amrikî disa ev proje bi rengekî xûrt aktîv kir neqşa Rojhilata navîn ber bi gûhertinê ve ye û gelên vê deverê bi tamamî pewistiya wan bi vê gûhertinê ye rejîmên van dewletan Iraq û Sûria û Iran êdî gelên di nav van dewletan bi hemû netwê xwe ve çav li Amerîka û Uropa ye ku arîkarbin bi wan re da diktatorên xwe jî kok rakin û ber bi jiyaneke bi rûmet ve biçin

deshalatên sitemkar weke rêjîma Iraqê û ya Sûriyê her wiha Iran zêda zordarî li ser gelên van dewletan kirin di dema dawî de hewil têne kirin rêjîma Iranê bê rûxandin ji aliyê gelên Iranê ve û Amrika li ser zimanê wezîrê derva nû got ew dê her cora arîkarî bo rûxadina vê rêjîmê pewîst bê bikin lê rûxadina we wê ne hasanî be rêjîmeke wekû şerpence ye destên wê di her deverê de heye li Iraqê û Sûriyê û libnanê û ymenê ku karê ye di van dewletan de karekî qerêj bi rê ve bibe di astekê de jî bo berjwendiyên xwe van walatan ne tenê bi sed sala li paş bihêle belê bi hezarê salan û ew bi xwe jî rih spî ne bi waye ku wê hazarê salan temen bikin ketina van kerekora bi rastî despêka jiyaneke zor xweş e ji bo netewên li Iranê her wiha li Iraqê û Sûriyê û libnanê û li tevaya Gerdûnê vêca ev sizayên Amrikî li ser rejîma Iranê ku karibe tenê zemînê bo gelên li Iranê dane netewên li Iranê wê karibin di demeke Kurt de ber bi welatekî cawaz ava bikin ku xweş arîkar be bo tevahiya dunyayê ji ber ku Iran weku ciyografî û gelên wê nimûne ne heger ne rêjîm ba wê Iran xweştirîn devera dunyayê be vêca pirs ew e ta çî rade ye rêjîma Iranê wê karibe li ber xwe bide we çend qurbanî herin li pêna ji nav birîna vê kolarêjîmê .



Kurd û Şûreşa Sûrî Xelesa 1 ê

Serhan Isa

Kurtepeyv:

Rêzdaran xwendevanên nirxubûna „Şûreşên Buhara Erebi” qûnaxeke pîr girîng û pêwîst e di jiyana hemî gel û pêkhatên Rojhilata navîn de, bi tayîbet ji bo gelên bîndest mîna gelê Kurd, ji layekî din ve, di pêvajoka ev ê „Buhara Erebi” de gelek têgeh hatin guhertin, mîna têgeha mafê mirovan, Demûkratî, wekhevî, û gelek têgehên din, her weha derfetek zêrîn bû ji bo hemî pêkhatên Olî ku xwe derbîbirin û xwe organîze bikin û doza mafê xwe bikin. Di xelekên vê xwendina xwe ya rexneyî de, ya bi navê „Kurd û Şûreşa Sûrî” em ê di destpêkê de kurt û puxt li ser „Buhara Erebi, Şûreşa Tûnis, Misir, û Lîbiya yê” bi axivîn, paşê em ê hûr û kûr li ser Şûreşa Sûrî û rola Kurdan di vê Şûreşê de, û qizinc û ziyaneke ku gihandin pîrsa netewî ya gelê Kurd li Kurdîstana Sûrî bi axivîn.

Di beşê dawî ji vê gotarê de em ê li ser çawanîya çareserkirina pîrsa Kurdî li Sûrî bi axivîn.

Buhara Erebi

Buhara Erebi wek zarav di destpêka sala 2011 an de ji layê alavên ragihandinê û gelek çavdêrên siyasî û dewletan ve hate bikaranîn, mebest jê ew bû, peydakirina guhertinan di bingeha avakirina dewletên Buhara Erebi de, û rûxandina Totalitarîsmusê di wan welatan de. Bêguman divê em jibîr nekin ku Simbola ev ê Buharê pakrewanê Tûnisî Karker „Muhamed Al Bûezîzî” bû.

Tovê vê Buharê li gelek welatên Erebi şîn hat, mîna: Maxrib, Bahrên, Erebiştana Siûdî, Cezair, Sûdan, Kîwêt, Libnan, Iraq, Yemen û Ordî, lê di gelek ji van welatan de dikarîbûn bi zûtirîn dem ew ê Buharê dorpêç bikin piştî ku hindek guhertinên baş bi dest xwe ve anîn. Lê li Tûnis, Lîbia, Misir, Yemen û Sûriya yê dengvedan û rengvedana vê Buharê bi awayekî din bû, li Tûnisê ku Qûnaxa destê pêkê bû, di 29 rojan de Şûreş bi serket, û navê Şûreşa xwe kirin Şûreşa Yasîmîn.

Her weha li Misrê di 25.01.2011 an de dest pê kir û di 11.02.2011 an de bi serket.

Şûreş Lîbiya pîr diwartir û hartir bû ji herdu Şûreşên berî xwe, ji ber gelek sedeman ji wan:

1 - Şert û mercên vê Şûreşê cudatir bûn ji yên berî xwe

2 - Miletê Lîbiyayê di mentalîte û avahiyê xwe de cudatir ji milletê Tûnisê û Misrê.

3 - Leşkerê Lîbiya yê, mîna leşkerê herdu welatan bi rola xwe ya netewî, ewlekarî û parêzvanî ne rabû.

4 - Rêcîma Lîbiya yê, di bingeha xwe de, rêcîmeka istixbaratî bû ku bi kesayetîya „Rêber” Qezafî ve girêdayî bû.

5 - Lîbiya ji layê Ciyosiyasî û berjewendiyên Ewropîyan yê aborî ve pîr girîng û pêwîst bû.

Ji lewma jî Nato neçar ma ku destdirêjîyê di Şûreşa Lîbiya de bike, ku di encamên de Leşkerê Lîbî rûxandî û Qezafî û zarokên wî kirine nêçîreke pîr hesan û erzan ji Şûreşvanan re, piştî ku di 17.03.2011 an de Encumena Ewlekarîyê biryara numre 1973ê yan stîandî ku di encamê de asîmanê Lîbiya yê ji bo Balefîrên Lîbî qedaxê kirin.

Di nivê Adara 2011 an de êdî ji bajarê Dera yê zarokên dibîstanan çirawîskên Şûreşa Sûrî pêxistin û hêdî hêdî li tevayê Sûrî agirê Şûreşê pêket, û heta nuha berdewam e ew jî ji ber gelek sedeman, sedemên sereke:

1 - Alîkariya Rûsiya, Sîn û Iranê ya bê sînor ji Rêcîma Bais ya faşîst re

2 - Leşkerkirina Şûreşê.

3 - Desthilatdariya Misilmanên Radîkal li ser Rikaberîya Sûrî, anku bi wateyeka din, Misilmankirina Şûreşê.

4 - Desttêwerdan û destdirêjîya gelek dewletên cîran û herêmê di gewdê vê Şûreşê de.

5 - Neyekrêziya mala Kurdî ew jî faktorekî bingeîn bûn di ne biserkeftina Şûreşê de.

Bêguman berî evan dewletan hemîyan li Yemenê millet rabûbû ser xwe, û şer, kuştin û xwepêşindanan dest pê kiribû, lê serokkomarê Yemenê Alî Ebela Salih dikarîbû heta demeke dirêj xelkê bihedînîne û wan bi sozan razî bike, lê di 11.02.2011 an de agirê Şûreşê bi temamî pêket û gelek serleşker tevî Şûreşê bûn, ku di encamê de di 23.11.2011 an de serokkomarê Yemenê Alî Ebela Salih neçar ma ku di bin çavdêriya Encumena alîkariyê ya Xelîcê û Encumena Ewlekarîyê û emerîka de peymanê bicîhêlana kursiyê serokatîyê imze bike, bêguman piştî ku soz danê ku ew û hevalbendên wî newîn girtin û dadgehkirin.



Wer hêjî Caş û Daşên
Xwefiroşên 66 û 16. 10. 17 bi
Bêsermîti, Rûreşiti û Dêllikîti
ve didin bîzîrezîrkîrî

Mihemed Salih Cuma

Werjî em Kurd jî bî saya Piştgiirtina Dewlet û Miletê Israîlê ve bî pêwistî û neçartî ve Kurdîstana xwe ji bin Tapanên Hovberên Sawdarî Daşitiya Koletî û Benditiya Ayîna Xîşxaşa Mûlmantiya Ereb ve bî lez û bez ve bîdî bîzîgarîkirin û wê bî Serxwebûna wêna ve û bî Konfederalîtkirina wêna ve ligel Israîlê de bîdî bîxelatkirin. Ev Serdema me bî Serdema Nuhî Siyaseta Trump ve dî tevahîya Veguhertina Siyaseta Navnetewî de dî piştî Siyaseta Cenga Cîhanî Duwem ve dî seranserî Cîhanê de bî carekê ve tête bîderkevtin. Li gora bîr û bawerîya min de Sê Merov bî hemû Zalbûn û Xurtbûn ve dî Çareserkirin û Danîna bîngehên Nexşa Siyasîyî nuhî Rojhilata meyî Navînîyî Agirpêkevtî de xweser didin bikêrkirin. Evjî bî bîrêzên Trum, Potin û Netanyahu ve têtin bîderkevtin. Herwehajî pêrejî divê bî kurtî û gîvaştî ve û hêjîbêhtir bî gîvaştî ve jî hemû Miletê Kurd re dî seranserî Kurdîstanê de dî vê Serdema me jî dê bête bigotin, ku ev Hersên Merovên Zalदार, Desthilatdar û Kêrdar tevde bî hev re bî saya Milet û Dewleta Israîlê ve bî Gewretirîn piştgiirtvanên lezbûna Serxwebûna Kurdîstanê ve li ser Gewde, Term û Kelexên Dewleta Turkî, Iranê, Îraqê û Surî ve bî rast û durust ve û bî carekê ve jîber Metirsdarîti û Daşitiya Xîşxaşa Ayîna Musulmantiya wan Dewletên hanê ve bî rast û durust ve û bî carekê ve tête bîderkevtin. Wer rewş û zînetên zeman jî alîkî ve û hokarên pêwistî û neçartî jî alîkî dî ve tevahîya dijûnên bîncîkirîyî gîvaştî û sitewyayî bî darêzorê ve dî vê Rojhilata meyî Navînîyî Agirpêkevtî de didin bîderxistin û bîpeqandin. Belê tevahîya Siyaseta Iranê dî Rojhilata meyî Navînîyî Agirpêkevtî de dî seranserî mêjûwa xwe de dî piştî Cenga Cîhana Duwem de Wehajî metirsdarîya Gûr û Har bî ser Aramî û Asayîş hemû Dewletên Deverê de û li ser Berjewendî û Kara Dewletên Kêrdar û Zalदार de dî Diverê de nahtîye bîdîtin. Têvî girêdana Peymana Hesteyî 51+ jî ligel Iranê jî de der sala 2015 jî de mûyekî Dewleta Iranê Siyaseta xwe bî tu renegî ve nedate bîveguhertin; bî servajî vêjî ve wê Siyaseta xwe bî deha car ve dî tevaya Heremê de bî dadana cengên wêrankirîyên Naxweyî de date bigûrkirin û bîharkirin û bî Sawdarîti û Daşitiya we ve, belê bî nala Dewleta Nazîtiya Elmanîyî Hitlerî ve jî sala 1933 tanî 1945 de û perêjî dî encamê dawî jî de bî vêxistina wîna ve bî Cenga Cîhanî Duwem ve date bîvêxistin. Wer bî saya Siyaseta Trumpî Nuh ve dî

vê serdem me de dê tevahîya rêç û xaçîrêkan bî mebesta hîlanîna Peymana Hesteyî ve dî 12. 5.18 de li ber Hovberên Sawdar û Daşên Axondayên Iranî ve bî rast û durust ve û bî carekê ve bîde bîdadan. Gelo dê Iran xwe jî vê Siyaseta xweyî Hitlerîyî Nazîtiyî Elmanîyî xwekujî bîde bîvegerandin. Ez bawernakim; jîbervejiî ve, em bîvên yanjî nevên, dê Iran xwe rû bî rûkirina cengeke man û nemanê ve beramber bî Emerîka, NATO, Israîl, Şahên Ereb ûhd. ve bîde bîdîtin. Wer bî rast durust ve hîm dî 12. 05. 18 de dî hîlanîna Peymana Hesteyî de ligel Iranê de jî 51+ de der sala 2015 û hîmjîpêrejî dî 14. 05. 18 de dî Roja Serxwebûna Dewleta Israîlê de bî veguhertina Baholzxana Emerîka ve jî Televîv ve jî bona Orşelîm ve û bî pêrûniştî Orşelîm ve bî nala Paytextê Dewleta Israîlê ve jî bal Dewleta Emerîka ve tevaya Siyaseta Rojhilata meyî Agirpêvtî jî serî tanî binî ve bî saya Siyaseta Nuhî Trump ve bî carekê ve û bî rast û durust ve bî nemankirina Dewleta Hovberên Sawdar û Daşên Axondayên Dagîrkerên Serdarên Xîlxalîyên Xîşxaşkên Iranî ve û bî serxwebûna Kurdîstanê û konfederalîtkirina wêna ve ligel Israîlê de tête bîmîzgînkî. Ev bî tevahîya rastîyê ve tête bîderkevtin. Werî jî bervêjî ve, em bîvên yanjî nevên, dê bî lezbûna dadana Cenga man û nemanê ve li ser Iranî de jî bal Emerîka, Nato, Israîlê, Şahên Ereb ûhd. ve bête bîvêxistin. Ev bî tevahîya rastîyê ve tête bîderkevtin. Werî jî bervêjî ve, em bîvên yanjî nevên, dê bî lezbûna dadana Cenga man û nemanê ve li ser Iranî de jî bal Emerîka, Nato, Israîlê, Şahên Ereb ûhd. ve bête bîvêxistin. Feleka Bêbext em kuşatîn; bes û bî tenha ve me ev Feleka Nebûyî bî saya Nezantîya xwe ve jî xwe re bî tara bêjînga ser serên xwe ve dayîte bîdurustkirin. Belê wer bî hemû Eşkerebûn û Dîyarbûn ve û bî lez û bez ve Vêxistana Cenga man û Nemanê li ser Hovberên Sawdar û Daşên Dagîrkerên Serdarên Xîlxalîyên Xîşxaşkên Axondayên Iranî de jî bal Emerîka, NATO, Israîlê, Şahên Ereb ûhd.ve dê bête bîdadan. Roja zayîna te gelekî bî pîrozbayî ve jî bona malandîna Koletî û Benditiya Dagîrkerên Hovberên Sawdar û Daşên Axondayên Iranî ve li ser Destên Pehlewan û Qehremanên Pêşmergên Pêşwa ve bî xweserbûna piştgiirtina Milet û Dewleta Israîlê ve jî dil û can ve ez didîm bîpîrozkirin. Ez jî dil û gîyan ve tevahîya Karkerên Cîhanê bî gîştî ve û Karkerên Kurdîstanê bî taybetî ve bî vê Roja Cejna wan ve didîm bîpîrozkirin. Belê dê Çîna Karker ligel hemû Deste û Çîniyên din de roleke pîr mezin û giran dî Xebata meyî Rizgarîkirina Serxwebûna Kurdîstana meyî Perest û malandî



PARASTINA HEBÛNA ZIMAN SEMBOLA BERXWEDAN Ê YE

Ferhad Çêxo — Silêmanî

Ziman, jêrxan e û bingeha sereke ye ku netew xwe lê digrin, û giyana gelan jî vedijîne Ji ber ku ziman hebûn û nasnameya gelan e, divê ku em xwe bi zimanê dayikê bigrin, û bi zimanê xwe binivîsin û bixwînin û peyvên biyanî di zimanê kurdî de derxinin. Wek tê zanîn ku zimanê kurdî jî zimanekî dewlemend e û xwedî hebûn e û şaxek e ji zimanê hindo-ewropî ye û ji malbata Arî ye . Çend zaravayên kurdî hene, "kurmancî li bakur, başûr û rojavayê Kurdistanê, Soranî li başûr û rojhilat , Zazakî li bakur , Goranî li rojhilatê" tê bikaranîn . Kurmancî bi tîpên latînî tê nivîsîn û Soranî bi tîpên erebî. Di sala 1932 an de. mîr Celadet Bedirxan tîpên latînî di Kovara Hewar belav kir û ji wê demê de gelê kurd li bakur û rojavayê Kurdistanê tîpên latînî bi kar tînin Bêgûman dîroka ziman bi hebûna mirov ve girêdayî ye Ji ber ku rêjîmên sitemkar, dîktator û faşîst yên ku her çar parçeyên Kurdistanê dagirkirin piştî peymanê saykes-Picot di sala 1916an de û bînpêkirin û nedana mafên gelê kurd û astengiyan li pêşiya gelê kurd derxistin ji bo dûr ji (zimanê , nasnameya, çanda, wêjeya , folklor) xwe bikevin , lewra hin kêmasî hene di warê axavtin, nivîsandin û xwendin bi zimanê dayikê de, ûhin peyvên biyanî jî di nava peyvên kurdî de diyar bûye, Ji ber tînebûna dibistanên fêrkirinê û saziyên ziman û qedexe kirina pertûkên bi zimanê kurdî û kêmasiyên ferhengên kurdî ev

lewra hin kêmasî hene di warê axavtin, nivîsandin û xwendin bi zimanê dayikê de, ûhin peyvên biyanî jî di nava peyvên kurdî de diyar bûye. Ji ber tînebûna dibistanên fêrkirinê û saziyên ziman û qedexe kirina pertûkên bi zimanê kurdî û kêmasiyên ferhengên kurdî ev hemû bûn azar û kêşe li ser pêşketina zimanê kurdî Herwiha gelê kurd jî dûr ji zimanê xwe neket , û bi zimanê xwe ve girêdayî malê heger gel bixwaze xwe perwerde bike û xwe bi rêxistin bike divê di pêşî de, di warê ziman xwe perwerde bike û balkişandin li ser girîngiya meşq û fêrkirina rêzimanê Kurdî bikin, û vekolînan li ser zimanê kurdî bi dest bixin û berheman jî bi weşînin. Lewra ev ji zimannas, nivîskar, lêkolîner û rewşenbîr û helbestvan û ci kesê di warê zimanê kurdî dixebite tê xwestin ku aghedar bin û şiyar bin ta ku milletê kurd dûr ji zimanê dayikê nekevin, û berheman bi kurdî belav bikin, û her gavê jî semînanan li ser koka zimanê kurdî û kêşeyên li ser ziman li darxînin, û piraniya bala xwe bidin li ser zimanê kurdî de Ji ber ku pêşketin di warê ziman bengha herî serek e ye ji bo pêkanîn û avakirina welatekî bi hêz û rol di nav dewletên cîhanê Hebûna ziman sembola berxwedan ê ye Berxwedana herî pêşî de, di vê gelê kurd di warê zanîn û fêrbûna ziman pêk bîne, û bala xwe bidin li ser zimanê dayikê û çawa ziman pêşkeve, û zimanê kurdî jî rizgar bikin ji peyvên biyanî çî "Erabî, Tirkî, Farisî" be, û xebata herî girîng ewe ku nivîskarên kurdan li ser karê wergerandinê bixebitin ji bo ku gelê kurd pertûkan bi zimanê xwe bixwînin . Avakirina welat, di vê ku saziyên ziman di pêşî de pêkbînin, û mercê zanîna zimanê Kurdî li pêş her welatîkî bikin mercekî sereke û bingehîn, û parastina zimanê Kurdî ji wendabûnê biparêzin.



DEM DEMA YEKÎTIYÊ YE

Huşyarê Emerê Lalê

Eve zêdeyî heft salin li ser vê(şoreşe , talane, kuştinê) ka çi nav lê têkirin ya sûriyê derbas dibê bêtî ku bighê armanca xweya sereke , ew armanca ku hevbeşe di navbera hemî milletên sûrîde , ya ku bi tevayî bandikin bi roxandina rijemê , lê di warekî dîde em kurd weku netew rastî gelek arîşa dibin û nemaze dema em mafê xwe diyardikin ji pêkhatayên sûrîre ,neteweyên dî nerazîbûna xwe diyardikin weke ku mafê me di destê wadeye qebûlnakin û dibêjin divê hûn rawestin ta sûrî rizgarbibê ji rijema basiya û perlemanek bê hîlbijartin ka ew perleman wê qebûl bikê an na , ev çanda dagîrkirinê hê di mejyê wadeye tevî bihtirîn kesên opozisyona sûrî nivê jiyana xwe di welatê oropîde derbas kirine lê fêrî dîmuqratiyê nebîne lê ev regezperistiya wa (encehiya) wa çande û egerê wêjî evin .

1- hê Erebe sûrî bi ramanê regez perestî dijîn û bi çavekî kêr li me dinêrin û xwe dibînin welatîyên pîla yekê û netewên dî dibînin welatîyên pîla diduyê û sisiyê hê di heyamê berêdene ku bi navê mislmaniyê welat dagîr dikiran serweriya mîletan dikiran ,lê nizanin yan xwe nebihîstî dikin ku heyamê van ramanan çûne tevî ku di welatê medene û axa me dagîrkirine û saman û keda me dixun û hê nerazîne jî û mafê me jî qebûl nakin .

2- hê nêrîna me kurda ne zelale di warê mafê meyê rewade û hê bîr û boçûnê hevbeş diyar nebûne li ser mafê me kurda di sûrîde û hê pirojek kurdî diyar nebûye encama hebûna şê bîr û boçûnê cawaz di kurdîstana sûrî de (rojawa) .

Hebûna van encumenên çawaz dibê

sedema hebûna bîr û boçûnê cawaz ji ber ku her encumanek bi derkîve girêdayîye û hebûna van nêrînan dibê sedema lawaziya bizava kurdî li hember opozisyona sûrî . Di vî warêde ya girîng ewe ku bizava kurdî bi tevayî li gel hemî kesaytiyên niştîman perwer ,nivîkar , rewşenbîr , çalakvan û rexrîrawên civaka sivil bi tevayî di bin sêwanekî kurdî hevbeş de tev cih bigrin bêtî ku kes kesî tinebikê û çêkirna hêzek leşkerî hevbeş dibin vê sêwana kurdayetî de hingê emê bikarin bi xurtî mafê xwe bistînin ji ber ku maf tîn sitandin ne tîn dayîn û maf nayêne parçekirin û mirov ji ber mafê xwe fedî nakê ji ber ku mafê mîlletekiye ne mafê kesayetîkiye û ne mafê partîkiye. ka mafê mîletan di cîhanêde bi çi rengiye emjî zêdeyî wî mafî naxwazin lê em kêrî mafê mîletajî qebûl nakin ji ber ku emjî mîletin weke hemî mîletê cîhanê .

3- pêwîste rekeftînek nuh dinavbera hemî hêzên kurdîde bi zûtirîn dem bê avakirin ji ber ku rewş berev nexweşiyê diçê rewşa Efrînê , û tevahiya herêmen kurdî . derengî ne di bercewendiya medeye Efrîn nimûneye li pêşya meye îro roj roja kurdîtiyê ne roja partîtiyê pêwîst dikê ku em yek hêz û yek deng û yek helwîstbin di vê qûnaxa hestiyarde û dema rijem çû û sebata dengdanê hate meydana hîgê ka kî kar û xebat di ber mîletê xwede kiriye wê encamê bibîne ji ber ku mîllet mirova datînin û mîllet mirova radikin . de werin bi yek helwîst û dengî dakevin meydana kar û xebatê û bila dîrok rûpelên nû binvîsê di vê dema nû de û da em buharek nû vejînin û rewşek xweştir bibînin û hingê wê kurdîti bi ser bi kevê



KIRYARÊN GUHERTINÊ LI SER KURDAN HATIYE PÊKANÎN LÊ KURD NEHATIYE TEWANDIN..

Hevbeyvîn : Ferhad Şexo

Siyasetmedar, Nivîskar û lêkolîner ê kurd D. **Mehmûd Ebbas**, xwedi gelek berhem û vekolînên hêja, Çirûskefî şevên Kurdistanê ronî dike. D. Mehmûd Ebbas, sala 1952an li gundê Nesran ye girêdayî bi bajarê Tirbespiyê ji dayik bûye, îcazeta doktora di Erdnîgariya Aboriyê ji zanîngeha Moskow wergirtiye di sala 1988an. D. Mehmûd cîgirê serokê Yekîtiya giştî a Nivîskar û Rojnamevanên kurd li Sûriyê, û Şêwirmendê Encûmena Niştimanî Kurdistanî - Sûrî, û endameke ji damezrînerên saziya Kurdî - Emrîka li Hîwstin - Emrîka. Li bajarê Hîwstin ya girêdayî bi parêzgeha Teksas li USA rûdinê.

Rojnameya **Encûmen** vê hevpeyvînê ligel D. **Mehmûd Ebbas** pêkanî

1- Rewşa Sûriyê bi giştî nezalal e , tu çawa dibinî çareseriya siyasî li Sûriyê û çareserkirina pirsê Kurdî di nav de?

Rewş zelal e, perçebûna wê diyar dibe, lê ew bi ser nekeve, ne wek Tirkiyê û Îranê dixwazin, hebûna vê di Sûriyê de bi demê ve girêdayî ye. çareseriya wê, ne zelala ji ber kû ne Rûsiya û ne Amerîka vê demê zelal nakin, hin mercna din têne xwestin, di nav wê de, derxistine Îranê û Tirkiyeyê, û bi dawîbûna opozisyonê. Belkî du salan dirêj bike, Piştê wê herdu komarên sereke li ser Sûriyê ne navendî bi sistemeke Federal Yan jî bi navekî din, çarese bikin . Di wê demê de pirsê Kurdî wek Federalî bê pêşkêşkirin, ji ber ku Kurd ji herdu komaran re giring e , û herwiha kurd netwe duyemîn di Sûrî de bi demografiya xwe û hêza xweyî leşkerî ve jî.

2- Tu çawa dibine vekîşandina Emrîka ji peymanê atomê bi Îranê re, û di baweriya te de wê bandora vê vekîşandinê li ser Sûriyê hebe?

Biryareke paş e di piraniya xwe de. Sedema yekemîn ku Amerîkayê ji peymanê Atomê vekîşiya ji ber hebûna Îranê di Sûriya û Iraqê de, û ji bo ewlehiya û parastina Israîlê. Ji ber vê yekê jî wê zordestiyeke giran deyne ser barê Îranê

3- Nerîna te çiya ji bo rawestandina guhertina demografi li Efrînê û çareserkirin ji bo Efrînê çiya?

Dijmin şerê milletê Kurd dikê bi hemû rîyan re, ev guhertin yek ji wan amûran û rewşan e, lê di baweriya min de wê bi ser nekevin, ji ber ku kiryarên bi vî awayî û bi vî rengî hatine pêkanîn û kurd nehatin tewandin, û vê demê de demografiya Sûriya hemû tê guhertin, û ez bawerim dema ku çareserî ji Sûrî re bê danîn, û pirsgerêka Kurda têde bê guftûgokirin û ev problema wê bê rastkirin.

4- Çi pêwiste ji ENKS ê û Tev Dem ji bo li hev bikin?Kengî biryarên wan bûn ji wan?

wê demê wê bikaribin li ser xalên naştimanî li hev bikin, wek ku ji wan diyar dibe, herdu alî hevdu rexne dikin, û dibêjin biryarên we ne ji cem wan e.



KONÊ REŞ : STANDARDKIRINA ZIMANÊ KURDÎ LI AZADÎ û SERXWEBÛNA KURDISTANÊ VEDIĞERE

Hevbeyvîn : Ferhad Şexo

Nivîskar û helbestvanê kurd yê navdar **Konê Reş** ku pispor e di dîroka Malbata Bedirxaniyan de, xwedî gelek berhemên hêja û giring di nivîsgeha Kurdî de. Rojnameya **Encûmen** vê hevpeyvînê ligel nivîskarê hêja **Konê Reş** pêk anî.

1 – Di nerîna te de sedemên dûrketina keç û xortên kurdan ji ziman, wêje û çanda xwe çi ye?

Sedem dîrokî ne.. Li qedexebûna zimanê kurdî vedigere.. Nivîsandina bi zimanê Kurdî qedexebû.. Bêguman di wiha rewş de keç û xort dîrî nivîsandina bi zimanê dayika xwe ketin.. Ew kovar û rojnemeyên rêxistinan ku bi dizî derdiketin wek Gulistan, Gelawêj, Stêr û Xunav.. berhemên keç û xortan belav nedikirin, nav di wan de nedidan.. Vêca ew keç û xortên afrêner bi erebî nivîsandin.. Mêze kin, wêjeya kurdî a ku kurdan bi zimanê Erebi, Farisî û Tirkî nivîsandiye, wiha bi zimanê kurdî nehatiye nivîsandin!! Iro li Qamişlo, ji ber ku ew sansor ji ser zimanê me hatiye hilanîn, mehê 910- kes ji keç û xortan li deriyê min dixin, hez dikin ez li berhemên wan yên bi kurdî nivîsandine, mêze bikim..

2– Konê Reş çawa rewşa zimanê Kurdî dinirixîne? -Rewşa zimanê Kurdî li kû binirixînim?

Eger li Rojava be, zimanê kurdî serbest e. Ji qedexebûn û sansora berê rizgar bûye. Kêç û xortên me bi girsbûn berê xwe dane nivîsandina bi zimanê Kurdî û tev bi alfabeya Mîr Celadet Bedirxan dinivîsîn.. Belê sebareti rewşa ziman li seranserî Kurdistanê, wek ku diyar e, bi du alfabeya ye; Latîni û Farisî ye. Her du jî baş bi pêş de dimeşin.. Iro, ez bi wan geşbînim, belê sibe an di pêşerojê de divê yek alfabe ji zimanê kurdî re were berdestkirin.. Iro, da ku nebe problemeke siyasî di nav kurmançixêvan û soranîxêvan de, em deng ji xwe neyinin.. Em bi her duyan bawerin.

3 – Kêmasiyên me bi zimanê dayikê re pirin, çawa em ê bikaribin van kêmasiyan çareserbikin û pêşkevin û bi zimanê standard li seranserî Kurdistanê biaxifin?

Bêguman kêmasî pirin, hilanîna wan kêmasiyan barê zimanzan, zimanhez û rewşenbîra ye.. Di baweriya min de gava pêşî ji standardkirina zimanê Kurdî re li seranserî Kurdistanê, li azadî û serxwebûna Kurdistanê vedigere.. Gava duyem li yekitiya alfabeya Kurdî. Bi ya min be, ew alfabe gerek latîni be. Ji ber ku alfabeya Latîni bêtir li dengên zimanê kurdî tê kirin..

4- Berî demekê we Panela Pênasînê pêkanî, we çend panel lidarxistine û mebesta we ji van panelan çi ye?

Di roja 22'ê Nîsanê 2018'an de, roja 120 saliya rojnamegeriya Kurdî de min û mamoste Derwêş Xalib Panela Pênasînê beyankiriye, da ku em di wan panelan de, kesên afrêner, xwedî ked û pirtûk bi cemawerê xwe bidin naskirin, hem jî ku ew xwe bi xwe ji cemawer re xwe bidin naskirin û pisporiya xwe di berhemên xwe de diyar bikin.. Me yekemîn panel di roja weşana Hawarê de li mala Seydayê Cegerxwîn lidarxistiye û min têde, bi têr û tesel kovara Hawarê û jiyan û xebatên Mîr Celadet Bedirxan anî ziman.. Cihê lidarxistina pamelên me, mala Seydayê Cegerxwîn e. Me destûr ji kurê wî Keyoyê Cegerxwîn standiye.. Dibe ku em li cihên têvel jî çekin.. Niha çend nav li pêş me hene ku em wan pêşkêş bikin wek: Dr. Azad Elî, Dildar Şeko, Mehmûd Sebrî, Salihê Heydo, Enîs Mêdewayî..

Melayê Cizîrî Şêxê aşiqan e ²/₃

SELAM DARÎ



herdem di dema seherê de tê, da ku çavdêr nebînin.
Ji wê camê vedixum, lê ez xwe ji çavdêdêran vedîşêrim
da ku nebêjin Mela ji riya rast derketiye .

Bi vê yekê herdem ne li hişê xwe me, de sibha te bixêr xanima min:

Were ronahiya çavê min, da bejin û bala te bi bînim.

Naxwe Cizîrî naxwaze ku hişê wî lê vegere, û dixwaze herdem serxweş be, da ku bi giyanê xwe bighêje rasteqîniya gerdûnê:

بحق رندی خراباتم ژ دیری قی دمی هاتم
چ هیشی هون دکن | یروژ قی رندی خراباتی

Bi rastî ez pîrê meyhaneyê me, û niha ji dêrê ve tîm, çî hêviyê win îro ji pîrê meyhanê dîkin?
Bi çûn û hatina meyhaneyê şanaze ye, çîma na tiştê ew di bîne kes nabîne, û dengê ku guhê wî dibîze,
Tî guh nabihîzin, û zimanê wî jî gotina ji ilhama
Xudayî diêje, ji ber ku ewî meya xudayî ji mêjve vexwarîye:

ساقی ژاژل یک دو قدح باده بمن دا
حتی بآبد مست و خمار و تلسم از

Meyger ji mêjve du peyal ji meyê dane min, ta bi ebed mame mest û serxweş û lawaz nikarim xwe li xwe bigirim.
Erê ev meya xudayî ye ya ku Melayê Cizîrî pê kêfxweşbû û bû dîlê îşqa xudayî ji mêjve.

-û di helbetên Cizîrî de babet di nav hev de tîn ji ber hebûna meyê ciwanîyê dixwaze û ciwanî jî berhemê wê evîne:

داحه بدستی سری جاما ژرنگی دری
جذب ه گها جان ودل پر شوشاندن هما
باده ه نوشی ژدست چوده ژخوه ماحه مست
قطره به بحری گها بحری بعین خوما

Bi wî destê ku mirov dikêşe camek ji rengê durê bi min da, lîzîn giha giyan û dilê min, ez ji hiş xistim bê ku ti sedemên xuyayî hebin.

Me mey ji destê wê vexwar, ji hiş ketim û serxweş

Bûm, mîna dîlopekê tîkeve deryayekê û derya wek xwe ma.

Di vir de em dibînin ku mey û ciwanî û evîn dibin yek ta Cizîrî dîghêje qonaxa neyînê.

û ev helbest jî di wî warî de ye:

مستانه مستان نوشا نوش
قرقف دجامان هاته جوش
ما دی بمینت کس ل هوش
وقتی کو بین دردان ه رقص

Zor serxweşin ji ber ku gelk mey vexwarine, û meya ku tê pêşkêşkirin di peyalan de di fûre ji tûjbûnê,

Ma dê kes li hişê xwe bimîne dema ku ev ciwanên mîna berikê dura bîn ahenga semayê.

Cizîrî bi piranî simbolê meyê bikartîne, da bighêje rasteqîniyê û raz jêre diyarbibin.

می هاته فنجانا صدف کس دی قذوت ایرو بخف
ساقی بچنگ و نای ودف فرفور یا ههتاب دا



Hemdîn û Şemdîn

Luqman Suléman

Şopandin di hejmeta bê de

Ev çîrok min ji devê stranvana girtiye lê ez nizanîm navê wî çi ye.. wek wî gotiye: min jî nivîsandiye.

Ehmed Begê û Hisên Begê herdû birayê hevbûn xwediyê Zozanê Şeref dîne bûn. Temamê wî Zozanî di destê herdû bira de bûn bi ava xwe bi mêrg û çiya yê xwe bi deşta xwe bi kozê xwe. Herdû bira jî gelekî ji hevdû hez dikirin qedir û siyaneta hev dikirin ticara yekî xwe li ser yê dî mezin nedikir mirov birayê piçûk û yê mezin ji hev nasnedikirin hingî ev herdû bira ji hev re başbûn rojekî dilê wan ji hev nema ye. dibêjin Simaîl mîrekê Zozê ne bîst û pênc mîrekê Zozên di bin destê wî de bûn rojekî Simaîl ji wan re got maleva welehî we bilahî ev herdû bira Begê me ne lê min nedîtiye du Beg di welatekî de heyîn em nikarin karê vî bikin û karê yê dî bikin wele eva em şewitandin nabê divê em çarekî ji wan re bibînin. Em nema Karin karekî ji xwe re bikin nema em Karin li malê xwe rûnin me ji ber rihê xwe daye stû. divê em çarekî bikin va herdû bira ji ber hev bixin da ku yek ji wan bibe axa û em zanibin axa kî ye bi tenê heye da em zanibin pê re baxivin. Her bîst û pênc axa yê Zozên bi baldarî li Simaîl guhdardikin Simaîl ji wan re got em çawa bikin gelî axan?

Teva jê re got emê ji hev re sûnd bi xwin ku çi were serê me em li hev mikur newin û ji Simaîl re gotin tu çawa dixwazî em bi te re ne tu berê me didî ku esil tuyî Simaîl ji wan re got ser serê min ji wan re got binêrin lawo bi xwedê em nema karin vê zilma hanê qebûl bikin va em ji hev xistin tiştêk di me de ne hiştin. Lawo bi xwedê zilam bi du jina dibê lê pîrek bi du mêran nabe...

divê em yekî ji ber yê dî bixin dive em çarekî ji xwe re bibînin û wan berdî hev dive em şêraniya di nav wan de bikin dijminatî divê em bihêlin herdu bira di sêrika tivingê re li hev binêrin divê yek were kuştin bi destê yê dî. her bîst û pênc axa jê re gotin ka em çibkin? Simaîl ji wan re got: emê niha berê xwe bi dî dîwana Hisên axa yê delo dîn bavê Hemîn û bira yê piçûke aqilê wî germ e em şend galgala jê re bikin ez bawerî wê birayê xwe bi kuje ji xwe ku birayê xwe kuşt û ma bi tenê emê karibin ê emê wê demê felek û dewrana li serê wî bi gerînin û piştî demakî wî jî ji rêya xwe derxin yan emê wî jî bidin kuştin û yan emê ji Zozên bera wî din.



Xwendekar û Şoreş

Dijwar Tewfiq

Amûdê

Dema Barzaniyê nemir li yekîtiya Sovyêt bû ya berê şandek ji xwendekarên Kurdistan çûn serdana wî, bavê nemir ji wan re got: 'XWENDEKAR SERÊ RIMÊNE DI HEMÛ ŞOREŞA DE' pêdivîye guhdan bidine xwendin û zanîne çimkî hûnê di pêşerojê de serkirdayetiya vî milletî bikin, û tê nasîn dema navê ŞOREŞ tê gotin mirov di hizr û ramanê xwe de hestek bi azadî, wekhevî û rêzgarkirina wî ji dagîrker û stemkaran û mirov li dijî wan radiweste,

Di şoreşa Sûrî ya pîroz a ku ji DERAA û AMÛDÊ destpêkir û gihîşt hemû dever û bajarên sûriyê, xwendekarên sûrî û bi taybetî xwendekarên kurd roleke girîng û mezin lîstin li hemû deverên ku lê jiyan dibin û bi taybetî di Peymangeh û Zanîngehan de, bi pilankirina û serkêşiya civakê de, di her

Leyla Qasim

Yusra Zîpêr

di heyva nîsanê de sala 1974 an de Leyla qasim hate girtin li ser destê rêjîma faşîsit ya diktatorê Îraqê. di gel çar hevalên wê Leyla endama zanîngeha

bexdayê bû û endama yekîtiya xwendekarên Kurdistanê bû bi tometa kar û xebata wê di rêza şoreşa kurdî ya ko gelê kurd di **eylûlê** de di sala 1961 ê dest pê kiribûn bi serokîtiya bavê mezin mele **Mistefa Berzanî** Gelek êşkencên hovane hatin serê **Leyla Qasim** dema girtina wê di zindanê de . ji belî dest hilata faşîst . dûvre wêde hukmê darvekirina lê hate birîn lê berî werisê darvekirinê têkeve hustê wê daxwaz kir ko cilê fileklorî kurdî li xweke dûvre hilkişiya bi cilê xweyî bûkanî li ser

xwepêşindanekê de, û di nava kar û çalakiyên xwendekaran de avakirina rêxistinên civaka sivîl wek komele ,hevgirtin û hevrêzan bi bername û duruşmên nûjen ta ko xwendekaran bi rêxistin bikin û berxwedanê di ber maf û berjewendiyê wî bike ,û vejînkirina kesayeteke zana û rewşenbîr, belavkirina zanîn, çand û kultûr di nava civakê de, Pêwîst e ku xwendekarên kurd xizmetê bi armancên neteweyîya xwe bikin û Kar û xebatê ji bo avakirina jîngeheke tendurist di hemû warî de

û pêkanîna civakekî mirovserdest li ser bîngeha girêdayîbûna bi danezana cîhanî ya mafên mirovan. Di heman demê de pêwîst e di her cihê de ku mafê kurdan hate bînpêkirin, tevahiya xwendekarên kurd wê yekê şermezar bikin û di vî warî de yekhelwest bin ,lê belê xudanê guhertin û nûjiyanê di hemû civakê de xwendekarin.



darê darvekirin bi ser bilîndayî di roja 12 gulanê de sala 1974 an de . ta bimîne keça yekemîn di cîhanê de ku hilkişiya li ser darê darvekirinê bi ser bilîndayî bi vî keryarê gunehkar û gelek keryarên din ku ev rêjîm dikeve rêza hitler û mosîlînî û rêza diktatorên din yên ku gelek gunehkarî û kom kujî di mafê milletan de kirin **Leyla Qasim** ew nûnera keç û jinên kurd bû ya ku her tişt kir qurban ji bo azadiya milletê xwe û da xuyanî ku jin xwedî rolin di warê kar û xebatê de û di hemû warên jiyanê de warê çandî çivakî siyasî wê can û rewanê. **Leyla Qasim** bimîne steyrikek çirisandî li ezmê Kurdistanê

Vejiandina roja darvekirina Leyla Qasim

Dî roja semî de dî 12ê gulanê de rêxistina jina kurdî ya azad roja bûrandîna 44 slan li ser tdarvekirina pakrewana gelê kurd Leyla Qasim vejandî digel simînarekê ji belî berpirsa rêxistinê yusra zibêr ve hate xwendî li ser jiyana û xebata Leyla Qasim li bajarê Qamişlo.

Dî simînarê de daxuyani lehengiya keç û jinên kurd bi taybet pakrewana gelê kurd Leyla Qasim ew kaça ku jiyana wê çihê metirsiyê bû li cem dijminên keça milletê kurd li cem zordarên rêjîma bexdê dî simînarê de hat xuyani kar û xebata Leyla Qasim endama xwendekarên kurdistan û endama partî dîmoqartî kurdistanî û xwendevana zanîngeha bexdê û çawa tîrsa wê dî dilê dijminê wê de bû ku êrîşa xwe berdan li ser mala



wê tev leşkerên çekdar ku li derdora mala wê bela bûn û êrîş kirn li ser mala wê dî roja 27ê nîsanê sala 1974an de leya ew keça bîrwer û zana berî wê bigirin hemû daxuyani û palikên partiya xwe şewitandin ta raz û karên hevalên wê nekeve nav lepê dijmin de. Leyla Qasim ew dî simînarê de hat xuyani girtina lehinga kurd digel çar hevalên xwe yek ji wan dergistiyê wê bû ew jî cewad nehawendî yê ku karê wî li ser çapxana partiya wî bû. Gelek êş û eşkencî û jarî li ser Leyla barandin

barandin dema celadên wê li ber disekinîn û jê re digotin te çavê xwe dive yan kurdistan bi lehengî bersiv dîda û got min kurdistan divê wê demê çavê wênî rastê rijandî û gelek zor bi ser de anîn lê bûka kurdistan xwest got bixemla cil û bergên kurdî hilkişya li ser darê darvekirinê dema ku hiştin malbata wê serdana wê bikin daxwaz kir ji dayika xwe got li ser hêstira nebarîne û cilê reş li xwe neke ji ber xweş bawer bû ku ew e bûka kurdistanê ye.

Dî simînarê de yusra zibêr da xuyani roja darvekirina wê dî 12ê gulanê de sala 1974 de ku Leyla Qasim ew keç yekemîn e dî cihanê de hilkişya li ser darê darvekirinê bi ser bilindayî.



Roja Zimanê Kurdî

Encûmena niştîmanî Kurdî li Sûriya hevrêza pakrewan Nesredîn Bîrhik û Yekitiya Jinên Kurdistan-Sûriya

Bi boneya roja zimanê kurdî, dî 15/2018 5- an de li nivîsgeha yekitiya jinên kurdistan û bi vê roja pîroz simînarek li darket, û mamoste Mihemed Kose dî vê pêşdanê de ev gotin li ser dîrok û aloziyê ziman got: wek tê nasîn û dibêjin: ziman ji nerîn û ramanên mirov der dibe, dema mirov bi nerîn û ramanên xwe tiştêkî bike, ziman wî tiştî pêk tîne, ango ziman alaveke ne bêtir. Roja ku mirov li ser riwê zimînê peyda bûye bi ziman, nerîn û ramanên xwe jiyana xwe derbas dikirin, helbet civaka mirovahiyê dî hemû cih û waran de, taybetmendiyê wanî ziman hebûn ji ber ku ne hemû gel wek hev dijîn, û her warek ji warekî neyeksan bû û cuda bû, lê dîsa jî dan û standî bi hev re dikirin çî dî bazirganiyê de yan jî tevgera mirovan civakî de, û ji ber vê yekê ziman ket nav hev de, û peyv bi devkî hate guheztin, û zimanên hemû gelên cihanê tevî hev bûn, lê ew gelên nêzî hev bêtir zimanê wan bûn malbatek ji zimanê cihanê. Zimanê kurdî zimanekî

arî ye resen e kevn e, gelek zanyar dibêjin zimanê kurdî ji malbata zimanê Eyrani ye, lê li gorî xwendîna min ji ziman re dijim: zimanê me ji hemû zimanên gelên rojhilata navîn kevintir e. Ji ber ku zeradeşt pêxemberê hemû gelên rojhilata navîn e, û pirtûka xwe ya olî bi nava Evesta bi zaravêkî kurdî nivîsiye, helbet li gorî dibêjin ev pirtûk berî zayînê bi 3ê hezar sal hatîye nivîsandin, û li ser çermê 12 de heza çêlekan daniye û jimara gotnên Evesta jî 345 hezar gotinan ne, û li gorî tê gotin 85 hezar gotin tenê xuya ne, piştî gelên rohla bawerîya xwe bi oldariya zeradeşt kirin û ketin nav hev û bi hev re dijyan, heta imbetoriya mîdiya rabû û gelên rojhilat dî dîn siya vê imbetoriyê man, û zimanê mîdiya bi zaravê mad dî axivîn, û mad bingaha zimanê kurdî ye û îro kurd pê dî axivîn, û piştî şkandina mîdiya bi destê koreş dî sala 553an de berî zayînê zimanê kurdî ket warê qelsbûnê de. û roj bi roj zimanê kurdî bi şûn ve vejerîya heta misulman hatin, û şûrên xwe kişandin û kurd bûn misîman û dest bi xwendîna zimanê qur'anê kirin ji wan bêtir, û zimanê kurdî hat jibîr kirin û gelek ji oldaran ziman qedexe kirin, û çî kesên bi zimanê kurdî dî axivî ew sûclî dikirin bi kufrê, heta gihîşte qonaxekê ku ziman nema, û dî wê demê de Ehmedê Xanî helbest bi kurdî nivîsand, û stranên wî belav bûn dî nav gelê kurd e û hate guheztin, û bi saya hebestên wî û bi saya dengbêjan ziman hat vejandin.....



Adilê Evdîle

Cawê Rengîn

Dayika min her roj spîdê, ku ez amade dikirim, û berê min dida Dibistanê, ji min re digot: Kurê min, kezeba min, ez gorî te bibim, tu baş guh bide xwendina xwe, hîviyên me tûyî, em di hejariyê, kêmtariyê de rizîn, bavê te nexweş e, kabokên wî nema dirahêjin laşê wî, piştê wî xûz bûye, ji rahiştina barên giran, çavên min û bavê te û her pênc xwişkên te li te ye, hîvî û omîdên me tûyî, xwendina xwe bi dawî bîne, da tu karekî li nik Dewletê bibînî, belkî tu bibî karmend, û nanekî ji me re peyda bikî Min şev û roj kirin yek, xweşî û xortaniya xwe avêtin pişt guhê xwe, hemî leystikên xortan, xwarin, vexwarin, qeremaç, çigare, gok, yar û dostik, ta min bawernama Bekaloriya wergirt, divabû ez karê leşkeriyê jî pêk bînim, wekû merc, ji bo bibim karmend, min berê xwe da leşkeriyê, ew jî qdand, paşê li kargeh û dezgehên dewletê di geryam ji parêzgehekê di çûm parêzgeheke din, her ku vedigeryam mal dayikê dipîrsî: Kurê min ma rêya te toz negirt, yan digot :Ceye yan Genime? Min digot:Wê xweda çêbike dayê,xema nexwe, weha roj û meh derbas bûn, bêyî karekî bi dest min bikeve, rê li ber min hatin girtin, li bajarokê me min ji xwere firoşgehek kirê kir, hinek pêdiviyên keçan û afretan(iksiswarat) tê de danîn, min dît wê guncaw be, min firoşgeha xwe tekûz kir, dema keç tên firoşgehê ji min di pîrsin: ma te ji xwe re jinek nedîtiye? Ez dibêjim : Hîna ziwe,bîrek devên vekirî li hêviya minin,Buhar derbas bû, Havîn hat, ew derman û pêdiviyên keç û afretan, xwe li ber germê ne digirtin ji xwere rondibûn, min çû cawekî rengîn kirî û sêwanek li ser pêşiya firoşgehê re çêkir, lê piştî sê rojan Endamên parastina Dewletê hatin deriyê firoşgehê bi şîma sor dadan bi bihana ku rengê cawê sîwanê yên Ala Kurdî ne



Pisî

**Pisî pisî nan garisî
Kete çalê Pê fetisî
Pisîkê gurnêw
We re tu natirsî**



**Yek û yek, teyrikê belek
Zaza bilbil, dermanê dil.
şekir û şîma, li ber çema
Çem çikçikî, av tê nema**



Guro

**Guro guro
Dev li keviro
Çêleka me nexwe
Em gune ne
Here ya mamê Silo**



Ziman Nasnameye

Hîşyarê Emerê Latê

Ziman jiyane ziman hebûne

Ziman evîne ziman derûne

Heste rewîşte awaze hîne

Ziman elinde ziman vejîne

Ziman dîroke dil û helbeste

Ziman çiroke ziman mebeste

Ziman şîrîne zanîne xweste

Ziman daxwaze ziman helweste



Ax dayê

Diya Şiyar

Cima buhara welatê me zerbûye û cilmisiye
Cima îro zengilê histê pezê dayika min bêdenge
Cima meşka dewê dayika min bi dîwar ve hişkbûye
Cima sîtilên şîrê dayika min vala mane
Dayê di van şevên reş û tarî de çidibe û wê hîn çibibe
Dayê di tirsîm ku ez ji welatê xwe dûr bikevim
Dayê bihêle ku çavê min ji ronahiya çavê te têr bibe
Dayê ez hêvî dikim tu min di paşla xweda veşêre
Daku tiliyê destê min di van kezîyê porê deta cî bigire
Dayê dixwazim bibim simbolek dinav xaka kurdîstana
xweda şîn bibim
Dayê da ku ez bibim kevoka aştiye û dengê azadiya
welatê xwe
Ax dayê ax dayê



Pênûs diçe çepê pelê

Dibe helbest

bi kurdî xweştir e

Jinda Mihemed

Pênûs diçe çepê pelê
Dibe helbest bi kurdî xweştir e
Ger ez pêsnê asîman bidim
Bi kurdî dûr û şîntir e
Ger ez pêsnê rokê bidim
Pir bi ronahî û germtir e
Ger ez pênûsê çavê te bidim
Xemla cihanê dibe ji te re
Pênûs diçe çepê pelê
Dibe helbest bi kurdî şêrîntir e
Ger ez ban pênûsê dikim bi kurdî
Baskê wê çêbibe û pê difire
Ew dizane ku hestê min tev
Pê despê dike pê dafire
Ew dizane ku helbestên min tev
Ji nav zîmanan lê digere
Pênûs diçe çepê pelê
Dibe helbest bi kurdî bi hestir e
Dema hezkirinê bi kurdî dinivîsim
Cerg û hinav tev disincire
Û ger bêrîkirinê bi kurdî bêjim



Perî

Bavê Helbest

Dema ku perîyeke evra xwe li ser rûpelê
nigar bike...helbestvanî diherife.. Perî
Sirûda rojeke awarte Di xeyalê min de
bişkivî Çirûskek xweza Di bejna demê de
lîvî Hê geş dibe Xweş dibe Di dome Li ser
pelên deyxê dilûse Pelên deyxê Li ber
pelên çavên perî diherifin Xwe davêjin sira
germê Xwe davêjin çira demê Rizgar û azad
bibin Di asoya hêviyê de dinûşe Perî
ferhenge Di roj û şevê de Xweristê Sortirîn
gul vejandin Birûsk û tavan Geştirîn ronahî
vedan Ji bo di spehîbûna xewnên te de
rewabim Perî ferhenge Di stran û awazan
de Pencerê Xweştirîn awaz diristin Çend
gavan bi paş de vegerya Pêrî û nameyek ji
ezman Ji bo di sînga pencerê de rewa bim
Perî... Bi jor de difire Di demjinêrek evra de
Li pistepista nijmên xwe guhdarim Di berî
rojhilat de. Riya xwe nabînim Bi melûfî Li
ser tejika bê hêviyê Ber bi jêr de fîfirim
Perî Ji nijkave Ji sirûda te veduxum Mina
mijê Ku tû nizanibe ji kûve tê Min dît Çawa
bi ser min ve tê Min bilimdiya te pîva Ji
nûve... Di wateya perî de gihiştim Perî.. Ji
kenê perî Kevok difirîn Keskesor dafirîn
Candar jîndar dimînin namîrîn Aştî û aram
rast di çerxê de digerin.